
# Bi rokirin/rijandima elektironîkî dest pê bikin



## Pirtûka rênimaya hêsan ji bo iPhone

Länsstyrelserna

# Çima pirtûka Rênimayê?

Li gorî vê ku niha gelek ji me hatine dûrkirin ango îzolekirin, bi sînodarbûna hatinûçûnê di nava civakê de û hevdîtina bi kesên din re, pêwistiya me bi rokirina diravê mesrefan bi rêya telefona biaqil û tabletan zêdetir bûye. Ên ku hînî vî karî nebûne û kesekî/ê wan nîne ku bikare bi xwe alîkariya wan bike, dibe ku destpêkirin biarîşe be. Länsstyrelsen (Konseya Dayîreya Bajêr) rênimayeka hêsan ji bo telefon û tabletê, çi ji bo Andriod û çi jî ji bo iPhoneyê amade kiriye ku hêvîdar im kêrhatî be.

Ev pirtûka rênimayê her wiha dikare ji bo nas û xebatkarên beşa çavdêriya tendirustiyê kêrhatî be.


Ev rênima li gorî telefonên iPhone hatiye çêkirin. Heman rêbaz ji bo markeyên cûrbicûr pêk tê, lêbelê dibe ku awa hinekî ciyawaz bin.

Naverok


Çima pirtûka Rênimayê? 2


1. Hesabê bikarhêneriyê çêbikin, wekî Apple ID 3
2. Bernameya bankeyê û Mobile BankID daxîne 13
3. Bi Swishê daxînin û ro bikin 26
4. Agahiyên ewlehiyê bi rêya polîsê 37

# 1. Hesabê bikarhêneriyê çêbikin, wekî Apple ID




Ji bo daxistina bernameyan ango ("app" an), wekî Internetbank, BankID û Swish bi rêya App Store'ê ku di telefona we da hatiye qeydkirin, pêwistî bi Apple ID'yê heye.


1. Ji bo destresiya li birêxstinê, “Birêxistin” hilbijêrin.




2. “Têketina li sîstema iPhone” ê hilbijêrin.



Ger hesabek li jor bê nîşandayîn, pêwîstiya we bi çêkirina hesabeka din nîne û dikarin ji vê beşê derbas bibin û biçin beşa 2 di rûpela 13an da.




3. Li ser nivîsê bitikînin: “Gelo we Apple ID nîne yan we ew ji bîr kiriye?”



4. Li ser “Apple IDyê çêbikin” ê bitikînin.





5. Dîroka rojbûnê lê zêde bikin. Piştî bidawîbûnê, li ser “Ê piştî vê” yê bitikînin.




6. Nav û paşnavê xwe binivîsin Dû ra, li ser “A piştî vê” ê bitikînin.





7. Emaileka heyî hilbijêrin an jî emailekê iCloud çêbikin (tê pêşniyazkirin).




8. Emailê lê zêde bikin.
   "A piştî vê" yê bitikînin.




9. Ev dê emaila Apple ID a we be. Li ser "Bidomîne" yê bitikînin.




10. Şifreya xwe dubare binivîsin. Piştî bidawîbûnê, li ser “Ê piştî vê” yê bitikînin.





11. Hejmara telefona xwe binivîsin. Piştra, li ser “Bidomîne” yê bitikînin.



12. Bi rêya Merc û Rêbazan derbas bibin. Li ser “Bipejirîne” yê bitikînin.




13. Careka din jî Merc û Rêbazan bipejirînin.




14. Niha hûn dê têkevin sîstemê.





15. Şifreya têketinê ya telefona xwe dubare binvîsin.



16. “Bê girêdan” kontakt û rûpelan bi hesaba Apple ID ve girê dide ta ku di dema windabûn an jî guhertina telefona we, wan ewleh bike.




17. Eyarkirina Apple ID niha kemiliye. Hesab di birêxistinê da tê dîtin.



# 2. Bernameya bankeyê û Mobile BankID daxîne



**Em ê du mijaran pêşber bikin**


A. Çawaniya daxistin û qeydkirina bernameya bankeyê 14

B. Çawaniya daxistin û qeydkirina Mobile BankIDyê 21

# A. Çawaniya daxistin û qeydkirina bernameya bankeyê

Bankeyên ku xwedî bernameyên bankeyîyê ne û BankID dişînin:


- Danske Bank
- Handelsbanken
- ICA Banken
- Länsförsäkringar Bank
- Nordea
- SEB
- Skandiabanken
- Sparbanken Syd
- Swedbank
- Ålandsbanken

Dikarin bernameyên bankeyan di App Store da bibînin.
Di rûpela din da çawaniya daxistina bernameyeka bankeyê pêşber bikin.




# Em ê li jêr qonax bi qonax çawaniya daxistin û qeydkirina bernameya bankeyê li ser telefona we vebêjin


1. Li ser nîşana “A” yê bi nivîsa “App Store” bitikînin.




2. Navê bankeya xwe binivîsin û lê bigerin.





3. Ji bo Mînak: Ez bi tikandina li ser wê rêzê, bernameya telefonê ya bankeyî hildibijêrim.




4. “DAXÎNE” yê hilbijêrin.




5. Bi “Apple ID” yê têkevin hindur.




6. “Veke” yê hilbijêre.




7. “Destûr bide” yê hilbijêrin.



8. Ji bo têketina li sîstemê yekî ji koda elktronîkî (kartxwîn) an koda kesane hilbijêre.




9. Ger we koda elektronîkî hilbijartiye hejmara xwe ya kesane binivîsin û "Têketina li sîstemê" hilbijêrin.



10. Kartxwîna xwe bi qeydkirina karteya bankeyî, dest pê bikin. Piştra ji bo têketinê rêbazan bişopînin.







2. Bernameya bankeyê û Mobile BankID'yê daxînin.


# B. Çawaniya daxistin û qeydkirina Mobile BankIDyê

Ji bo vê ku bikarî diravê tiştan bi rêya telefona xwe ro bikî, pêwistiya we bi pênaseya elektronîkî heye. Di vê gavê da sê pênaseyên elektronîkî yên erêbûyî hene: BankID ji bankeyan, AB Svenska Pass û Freja eID+. Pênaseya elektironîkî ya ku bigelemperî ji bo rokirinê bi kar tê Mobile BankID ye ku hûn bi rêya bankeya xwe di interneyê da sipariş didin.


Ger we berê ev yek nekiribe, ji bo destpêkirina karên bankeyî di internetê da serî li nivîsgeha bankeya xwe bidin. Dema ku vegerî li malê, ev rênima dikare alîkariyê bide te.




1. Li ser nîşana “A” yê bi nivîsa “App Store” bitikînin.




2. “Mobile BankID” yê di beşa lêgerînê da binivîsin.



3. Bi tikandina li ser rêzê, hilbijêre.




4. “Daxîneyê” yê hilbijêre û piştra “Veke” yê hilbijêre.






5. Têkeve internet bankeya xwe û Mobile BankIDyê sipariş bide. Ev ku internet bank bi we çawa ye, gorî vê ku we kîjan banke hebe dê ciyawaz be. Di pêşhatina her cûre pirsgirêkekê, ji kerema xwe bi bankeya xwe re bikevin peywendiyê. Piştra “BankID daxîne” (Hämta BankID)yê di telefona xwe da hilbijêrin.


6. Hejmara kesane û şifreya xwe ya çalakirinê ku bi rêya peyamê ji internet bankeyê werdigirî, lê zêde bike û binivîse.




7. Kodeka pênaseyê ku herî kêm ji 6 hejmaran pêk |bê hilbijêre. Ev yek kodek e ku hûn ji bo pênaseyê bi BankIDa xwe bi kar tînin.




8. Bi nivîsîna koda xwe, Mobile BankIDyê biceribînin. Piştra li ser “Nasnameyê erê bike” (Legitimera) bitikînin.



# 3. Bi Swishê daxînin û ro bikin




**Em ê kintirol bikin**


A. Çawaniya daxistina bernameya Swishê 27

B. Bi Swishê ro bikin 29

C. Rokirinê erê bikin 30


D. Bi Swishê ro bike - nezaketa zêde 31

E. Swish - Dîrok 33


F. Birêxistin - Bijardeyên dilxwaz, bijardeyên ku piranî swish dikin. 34

# A. Çawaniya daxistina bernameya Swishê


1. Li ser nîşana “A” yê bi nivîsa “App Store” bitikînin.




2. Peyva “Swish”ê di beşa lêgerînê da binivîsin, li ser lêgerînê bitikînin û gava ku xuya bû, bernameya Swishê gorî rêbazê daxînin.




3. Divê hejmarek bi Swishê ra bê girêdan. Bo cara yekem ku bernameya Swishê vedikî, hûn tên rênimayîkirin ku çawa wê birêxistin/tenzîm bikin. Yekem qonax, têketina li sîstema internet bankeya we ye. Ev ku internet bank bi we çawa ye, gorî vê ku we kîjan banke hebe dê ciyawaz be. Di pêşhatina her cûre pirsgirêkê da bi bankeya xwe ra bikevin peywendiyê.



# B. Bi Swishê ro bikin

1. Swishê vekin û "Swish" (Swisha) hilbijêrin.





2. Hejmara xwe binivîsin an jî li ser hêmaya zêdekê + bitikînin ta ku lîsteya we ya peywendiyê ango kontaktê vebe.

   Hejmarê lê zêde bike.


   Peyamekê zêde bike (ixtiyarî).

   Li ser "Swish" (Swisha) bitikînin. Ev yek ne bi vê wateyê ye ku dirav hatiye şandind. Di qonaxa din da hûn kuntrol dikin ku wergira we ya guncaw heye.



# C. Rokirinê erê bikin

1. Agahiyan kuntirol bikin.
   Bi koda pênaseyê têkevin sîstemê.





2. Tîr û stêrkên ku dikevin nîşan didin ku rokirin bi cih bûye.




# D. Bi Swishê ro bike - nezaketa zêde

1. “Bi karteyê bişîne” hilbijêrin.




2. Hilbijêrin dixwazin ji kîjan cure kartê bi kar bînin.



3. Li ser wêne/iconê bitikînin. Pişta kartê hatiye nîşandayîn.

   Li ser “Kartê hilbijêre” yê bitikînin.




# E. Swish - Dîrok


1. Ji bo dîtina rokirinên Swishê ku şandiye û wergirtiye, li ser "Dîrok" ê bitikînin.





2. Di beşa "Hemî" hemî Swichên têketin û derketinê dibînin. Her wiha dikarin "Wergirtî" an "Şandî" hilbijêrin.



# F. Birêxistin - Bijardeyên dilxwaz, bijardeyên ku piranî swish dikin.





1. Li ser wêneya/icona birêxistinê bitikînin.





2. Li ser "Bijardeyên dilxwaz" bitikînin.


3. “Bijardeyên dilxwaz ên nû” hilbijêrin.





4. Nav û hejmarên wan lê zêde bikin an jî li ser hêmaya zêdekê + bitikînin ta ku lîsteya we ya peywendiyê ango kontaktê vebe.



5. Li ser “Tîrnîşanê têke hindur” bitikînin.




6. Bi wê ra, hûn ê bijardeyên xwe yên dilxwaz di rûpela rokirinê da li bin nivîsa “Wergir” peyda bikin.



# 4. Agahiyên ewlehiyê bi rêya polîsê

## Girîng e ku di bîra we da be:

- Bi daxwaza kesê ku li we digere û dikeve peywendiyê, ti carî kartxwîn an BankIDa xwe bi kar neyînin.
- Ti sazî û kesekî/ê fermî ti carî bi rêya telefonê BankIDyê naxwaze. Ne banke, ne polîs, ne jî xizmetkariyên posteyê.
- Ti sazî û kesekî/ê fermî bi rêya emailê ji we daxwaza şifreyê nake. Ne banke, ne polîs, ne Maykirosaft ne jî Google.
- Sextekarî bi rêya peywendiya telefonî ên sexte her ku diçe zêdetir dibe.
- Gelek meriv bi xapandinê bi rêya agahiyên kart û kod an têketina bankeyê, diravên xwe winda dikin.
- Di dema hewldana têketina li sîstemê bi çendîn têketinên hevdem, peyameka agahdariyê di bareya sextekariya biguman di bernameya bikarhêner de tê nîşandayîn. Bi wê ra bi benkeya xwe ra bikevin peywendiyê.



# Bi Länsstyrelsen Dalarna bikevin peywendiyê:

Valentina Söderberg, telefon 010-225 03 89
valentina.soderberg@lansstyrelsen.se

Wilhelm Kyrk, telefon 010-225 05 27
wilhelm.kyrk@lansstyrelsen.se

**Agahiyên zêdetir di rûpela me:**
www.lansstyrelsen.se/dalarna/natur-och-landsbygd/stod-for-landsbygdsutveckling/grundlaggande-betaltjanster.html

Bi hevkariya Länsstyrelserna hatiye çêkirin.
Wêne: Wêneyên zêdetir

Länsstyrelserna